# Navê pirtûkê: Ez Zerdeştî yan Magûsî me?

**Berhevkirin: Felsefeya Zerdeştî**

**Weşanxaneya El Ereb ji bo çapkirin û belavkirinê**
**Navê pirtûkê: Ez Zerdeştî yan Magûsî me?**
**Navê Nivîskar: Ibrahîm Zirarî**
**Berhevkirina wejeyî: Felsefeya Zerdeştî**
**Hejmara depoyê: 25915/2024**
**Hejmara navneteweyî: 978-977-998-271-7**

**Werger û rastnivîsandina zimanî: Hevdîtina Ol û Baweriyên Mezopotamyayê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê**

**Bergsazî: Hevdîtina Ol û Baweriyên Mezopotamyayê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê**
**Rûpelsazî: Mihemed Wecîh**
**Hejmara çapê: çapa duyemîn**
**Rêveberê Giştî: Dr. Fadîa Mihemed Handuma**
**Weşanxaneya El-Ereb bo Weşan û Belavkirinê - Misir – Por Seîd**
**Jimara Telefonê: 00201030502390**
**dewanalarabegypt@gmail.com**

# Navê pirtûkê: Ez Zerdeştî yan Magûsî me?

## Berhevkirin: Felsefeya Zerdeştî

## Navê Nivîskar: Ibrahîm Zirarî

**Weşanxaneya El Ereb ji bo çapkirin û belavkirinê**

# Diyarî ji bo hemû kurdên Rojava ku Kurdên hêja ne

***Ez Zerdeştî yan Magûsî me?***

***Nivîskar û lêkolînvan: Ibrahîm Zirarî***

***Nirxandina Olî û Zanistî: Esrewan - Endaz Hewezî - Rêberê Hawza Zerdeştî***

***Çapa revîzekirî***

***Pirtûk: Ez Zerdeştî yan Magûsî me?***

***Nivîskar: Ibrahîm Zirarî***

***Sala weşanê: Çapa yekem 2023***

***Werger ji zimanê Erebî: Sûad Hikmet & Ciwan Umer***

***Edîtorî: Ciwan Umer***



*Zerdeştê Pendiyar*

## *Naverok*

**Pêşgotin ……………………………….…14**

**Zayîna Aşûzerdeşt û derketina Mazdaîtiy…………………………..….22**

**Magûsî…………………………..……....26**

**Başî û Xerabî…………………………....28**

**Yekanekirin……………………......…31**

**Her sê rêgez……………………..…....33**

**Agir di Zerdeştiyê de…………………34**

**Zerdeştî li Iraqê……………………….35**

**Neh hîmên ola Zerdeştî…………..…..38**

**Zarok Zerdeştî ji dayik dibe?.............40**

**Nimêj û Rojî……………………..…42**

**Bihûşt û Dojeh………..……..……..49**

**Lêborîn li gel zerdiştiyan……….…....52**

**Avesta…………………….……………..…..54**

**Ahûramazda jêdera pîtîferê (xêrê) ye - 101 navên wî hene…………………….57**

**Amîşaspîntan (enerjiyên erênî yên herheyî)………………………………..60**

**Cejn di Zerdeştiyê de……………...….64**

**SembolaZerdiştiyan"Foroher"………65**

**Jin di Zerdeştiyê de………………..……70**

**Zemawendî (zewac) di zerdeştiyê de……………………………………73**

**Kesayetên jin ên navdar…......……......77**

**Hevparên bi olan re…………….....…..80**

**Cihêrengiya di ola zerdeştî de…....…..83**



## *Nivîskar bi kurtî*

Ew ji dê û bavên kurdên Bexdayê ji dayik bûye, bi koka xwe girêdayî yek ji eşîrên naskirî yên Hewlêrê ye eşîra Zirarî, ku bapîrê kurdan (Selahedîn Eyûbî) ji wê eşîrê ye, ew li Hewlêrê dijî.

Lêkolînvan û pisporê felsefeya Zerdeştî û endamê encûmena bilind a Hewza Zerdeştiyê, xwediyê bawernameya fexrî ya olî (Esrewan) û endazyarekî pispor e di warê petrolê de ... gelek çalakiyên wî yên sivîl hene bi taybetî di felsefeya Zerdeştî de û di warê mafên kêmnetewan û pêkhateyan û aştiya civakê de, ji bo belavkirina ramana lêborîn, qebûlkirina hevdû, belavkirina hezkirinê di nav hemû netewe, nijad, reng û mezheban de dixebite, xwedê mirov bi yek awayî afirandine lê mirovan di nav xwe de cudahî çêkirin.

Pênc pirtûkên wî yên bi navê Katatê zerdeştiyê, Têgihiştina Zerdeştiyê bê xerabkirin û pirtûka Felsefeya Zerdeşt hene, ku li Dar Ereb ya weşan û çapkirinê li Komara Erebî ya Misrê hatine çapkirin, û pirtûka (Munecat) Bangewazîyên Zerdeşt ku wekî Sirûdên Zerdeşt tê dîtin û axaftina wî bi xweza û afirîner re û rihê pirtûka Avesta tê dîtin, û li Bexdayê - li weşanxaneya Saer Asamî hatiye çapkirin.

Ev pirtûka pêncem di warê ragihandina agahîyan bi awayekî kurt û bikêrhatî pirtûka yekem e û ya pêncemîn e di çapkirinê de, herweha pirtûkeke wî ya din jî li hêviya çapkirine ye, di nav wan de menahicên zanistî ji bo zanîngeh û dibistanan jî hene.

Ev pirtûk di warê felsefe û perensîpên Zerdeştî de jêderên girîng tên dîtin, herweha di rojnameyên herêmî û navneteweyî de di vî warî de çend gotar nivîsandine.

Bi şexsî beşdarî konferansên navneteweyî yên li Tirkiye û Sûriyeyê bû, û bi rêya Zoom li welatên Amerîka, Koreya Başûr û Ewropayê bi lêkolînên ku razîbûna zanîngehên navdar ên navneteweyî stend beşdar bû, gelek gotarên wî di warê felsefe û ola Zerdeştî de bi sê zimanan: Erebî, Kurdî û Îngilîzî hene.

Endamê hejmarek rêxistinên herêmî û navneteweyî yên ku di warê aştî, mafên mirovan û felsefeya Zerdeştî de dixebitin.

Heger mirov çand û dîroka kesên din binase dê karê belavkirina evîn, aşitî, biratî û qebûlkirina hev jî hêsan bibe.

Sedeqe ne erke lê kêfxweşî ye, sedeqe qencîyeke, şahî ye, û baştirîn kirinên qenc e û raza bextewarî û kêfxweşiyê ye, kesê ku qencîyên bê beramber bike ew ê dadmend û bextewar be.

Heger tu bixwazî karekî baş bikî, kurê xwe ji xwe baştir bike, bi vî awayî civak ber bi başiyê ve pêş dikeve û ber bi pêşketinê ve diçe.

## *Pêşgotin*

Berztirîn payebilindî ji bo ola dadmend, rast û tekûz re ye, ola ku ji Ahûramzada bi rêya pêxemberê wî Aşûzerdeşt gihaşte me, ola xwedayê ku Aşûzerdeşt xwe gihandiyê.

Bi navê afrîner Ahûramzada yê bexşîn ê, pîroz ê, bimbarek ê, qencîker û bi navê pîroziya ola Mazdaysnayî ya ku hêzê dide laş û jiyanê dirêj dike û pêşkeftinê didiyê, ez bi minetdarî dest bi vê kurtepirtûkê dikim, hêvîdar im ku bibe faktorek ji bo belavkirina lêborîn, biratî û hezkirinê di nav mirovan bi giştî de.

Duristî qencî ye, şadbûn e, baştrîn xêr e û razê kêfxweşîyê ye, kesê ku qencîyan bê beramber dike, dê dadewrî bibe taybetmendî û karê wî.

Derketina Zerdeşt di serdemeke pirxwedayî de bû, di wê serdemê de gelek stemkarî ji hêla dîndarên fesad (Karpan) ku hevalbendên dewletparêzên desthilatdar (Kawîs) bûn dihat kirin, peyama Zerdeşt ji olî zêdetir mirovî felsefî ye, ev peyam pabendî kêfxweşî û dilşadiya mirovan e, ji ber vê yekê em dibînin ku gelek feylesofên Ewropî ji Yûnanan dest pê bike, ta ku li ser asta tevaya Ewropayê derbas bibe Zerdeşt mamosteyê felsefeyê dibînin, gelek ji wan jî xwe wekî şagirtên Zerdeşt dibînin, ji wan (Nîtşê, Eflaton, Aristo) ji bilî wan jî hene, pirtûka Nîtşê (Zerdeşt wiha axivî ) bi perspektîfa Zerdeşt pênaseya bextewariya mirovî ye, tevî ku di hin nêrînan de bi awayekî din hatiye şîrovekirin, herweha pirtûka (Komara Eflaton) îfadeya wê bihuştê ye, ya ku Zerdeşt bi xwe bangawazî lê kiriye.

# Magûs û olên kurdî

Olên kurdî li gorî zimanê erebî ew olên Mog yan Magûs in, ku ji serdema sûmeriyan û heta dema niha rêveberê ol û civakê bûn, sê olên kurdan yên sereke hene: Zerwanî, Mîtrayî û Mazdaysnayî ya ku ji aliyê Zerdeşt ve hatiye rewa kirin, bajarê Babil di welatê Mezopotamyayê de navenda herî mezin ya Magûsiyan bû, behsa her sê Magûsîyên ku ji Babilê hatin û mizgînîya zayîna Mesîh (îsa) dan di (Incîla Meta Eshah 2) de hatiye kirin.

Magûsî di derbarê pakî, paqijî û sîstemê jîngehê de xwedî destûreke pir hişk bûn, ji wan re digotin Madiys an jî Magî, bi erebî navê wan bûye Magûs, Magûs kahînên olî û zanayên civakê bûn.

Di derbarê koka wan de gelek nerîn hene, tê texmîn kirin ku ew ji nijandên cihêreng bûn wekî: Arî, Xûzî, Xalidî, Kassî, Kûtî û Lûlû yên ku ji gelên Medî bûn û baweriya rastir ew e ku piraniya wan bi koka xwe ji Kassîya bûn, heman gelên navbûrî hebûna wan heya serdema Axmîniyan berdewam kir.

Mog an Magûsîyên Medî hewl dan ku şiyandariya Mediya di serdema Axmîniyan de vegerînin, wan şeş mehan padîşahî bi dest xistin, heya ku Daryûs ew ji holê rakir û mezinê wan Mazmugan Ghoumata kuşt, ji salê rojek ji bo kuştina Magûsiyan destnîşan kirbû,  jê re digotin roja Magûsiyan tê de destûr hebû ku hemî Magûsî werin kuştin, van Magûsîyan şaristanî û ola Mazda Basna ji Mezopotamyayê veguhestine welatekî ku ji aliyê erdnîgarî ve bi navê An Îran dihat naskirin Îrana îyroyîn ku di sala 1935an de hatiye damezrandin, tê de Şah hewl da ku

tevaya gelên ku li ser wê xakê dijîn asmîle bike û wan di bin navê gelê Îranî de bi nav bike.

Ji ber berdewamiya kuştina Magûsiyan ew koçî devera bi navê (Estxir) li başûrê Îranê bûn, bajar û dewletek ava kirin ku ji aliyê mezinê Mogan, Magûsiyan ve dihat birêvebirin jê re digotin Bagodad an jî Bexdad ku tê wateya diyariya xweda ( li gel Mesîhîyan di asta papa de bû û li gel Şîeyê Islamê wekî Ayeta Elah bû ) Bagodad xwedî hêzeke olî û siyasî bû, di birêvebirina kar û barên welêt de wekî lêvegera herî bilind dihat dîtin.

Sasan ji malbata Şwan kareh ya kurdî ye, di dewleta Mog de bû şahê Mogan ku dewleta Aşkanî hilweşandin û dewleta Sasaniyan avakirin, bajarê Bexdayê kirin baytexta xwe ji ber ku Bexda ji wan re pîroz bû, li welatê Mog yan welatê Magûsiyan ku ji başûrê Mezopotamya

heta herêma Germiyan li Kurdistanê dirêj dibû, di nav de Mîşan Mîsana îyroyîn û Hozan Ahwaza îyroyîn (Hewzeh koka wê Hewzeh) di heman demê de Kermenşah û Xanqîn ku welatê gelê Kassî bû, gelek perestgehên wan hebûn li hemû welatan belav dibûn û ya herî mezin perestgeha mezin li bajarê Asîna yê.

Têkiliyên Yûnaniyan bi Mogan re baş bûn û wekî nimûne Arsto û Fîsaxors xwe wekî şagirtên Zerdeşt îtîbar dikirin.

Magûs di serdema Sumer, Akad, Babil û Aşûriyan de xwedî roleke olî ya sereke bûn.

Magûsî di asta Pîr de bûn ku bi erebî wekî Şêx hatiye wergerandin û Şêx xwedî roleke olî ya bi nav û deng bûn, hîn jî ev rol berdewame.

Li gel Mogan mezinekî wan heye jê re tê gotin Mesmûxan an Mezmûxan, ku wekî Papa yan Aayetullah, mezin tê dîtin.

Mezmûxan yê dawî di serdema Harûn Reşîd e hat kûştin li bajarê Rey nêzî Tehran, piştî kuştina wî ola Magûsî ji hev hat veqetandin û bû gelek beş û lawaz bû, Efsaneya her sê olên kurdan ev e:

1- Zirwan ku tê wateya dema ku bi dawî nabe û tê de taybetiyên nêr û mê hene, Mazda û Ehrîman afirandine, di pişt re têkoşîna qencî û xerabiyê dest pê kiriye.

2- Mîsra, perestiya Mîhr, Mîrza, Mehrzade, Mîsraîzm an Mîsraîya, Mîhr tê wateya xwedayê peyman û sozê, xwedayê ronahî û evîniyê.

Silava bi destan tê wateya silava peymanê.

Mîhr Mezda şand ser erdê û tu hebûn li ser rûyê erdê tune bû, bi wî re gayek şand.

Belgeya herî kevn a ku navê xweda Mîhr tê de derbas bûye di navbera serdemên Hîtît û Mîtanî de bû.

Brîtanya (Îngilîstan) ji ber rehetiya desthilatdariya şaristaniyê bi armanca ku welat bindest bike hewl da ku dîroka Mogîyan xera bike û bi Hindistanê ve girêbide herweha Almanan jî bi xerabkirina dîroka Zerdeştî hewl dan ku ji xwe re dîrokeke xurt biafirîn in.

Bajarê Hewlêrê bajarek Hûrî e wekî bajarekî pîroz ji van xwedawendan re dihat dîtin û Hewlêr tê wateya bajarê sê xwedawendan lê piştî ku Aşûriyan dagir kir navê wê kirin bajarê çar xwedawendan û bû Arbaîlo.

Meşda an Mezda – Xwedayê şihrezayî (zanîn) û ronahiyê ye.

Zerdeştî di serdema Sumeran, Medan, Farsan de jî hebûn.

# Zayîna Aşûzerdeşt û derketina Mazdayetiyê

Tesbîtkirina zayîn û derketina Aşûzerdeşt zehmet e lê li gorî lihevkirina piraniya nerînan beriya zayîna Mesîh bi (1000) salî bû, ew li herêmeke ku dikeve navbera bajarên (Serdeşt û Urmî) li rojavayê Îrana niha, yan jî nêzîkî gola (Çî-Cest) li rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye, ew bi koka xwe Aryen ne.

Di wê demê de bavê wî ew şand gel mamosteyên zane ango Mogan (Magûs) ji bo ku bixwîne û fêr bibe, piştî qedandina xwendina xwe di destpêka xwe de bijîşkî kiriye, pîşeya wî bijîşkî bû.


free-amozesh.blogsky.com

Aşûzerdeşt hemû xwedawendên ku jê re digotin (Daîva) ku heta îro di kurdî de wek (Dîo û Dîv) je re tê gotin ji holê rakirin, xwedayek bi navê (Ahûramazda) diyar kir, Aşûzerdeşt bi rêya lêkolîn û lêgerînên bi hûrbînî gihaşt wê encamê ku xweda yeke, di ser zeman (dem) û serdeman re ye.

Wî zagona hişê saxlem di heman demê de jî zagona cîhanî ya diqetê afirandiye, ew damezrînerê pergala gerdûnî ye, ev her du rêgezên ku gerdûnê bi zanebûn birêxistin dikin.

Di ola Zerdeştî de ji Zerdeştiyê baş re (Eşvan) tê gotin, ew ê ku di jiyan û baweriya xwe de (Aşa) rêya rastî û durustiyê dişopîne.

Ji gotinên Aşûzerdeşt ((Katat)),(yasna 48-hat 7): ( Ez bi kar û hizirên xwe yên qenc yên ku ji bo te ne didomînim, min hîn bike û bihêle ku ez giyana te nas bikim, te pêşî çawa dest pê kir û mirovahî afirand, ey xwedayê pendiyar, da ku ez bikaribim wê li mirovan belav bikim, wan fêrî avakirina jiyaneke bextewar bikim û reftarê mirovî vegerînim paqijiya wê ya sereke, li xwezayê û pêşketina di rêya rast de vegerînim ).

Navê vî olî Mazdayetî ye, lê ji ber derketin û şopandina pêxemberê wê Zardeşt bi Zerdeştî hat bi nav kirin, li gorî rêçikên Zerdeştî û olên Aryen jî ola Zerdeştî di ser her olan re ye û pêxemberê wê Zerdeşt di ser her pêxemberan re ye.

# Magûsî

Mog bi koka xwe peyveke Avêstayî ye ji peyva (Megoş) hatiye, bi zimanê yûnanî (Magîos) û bi zimanê ingilîzî (Macîk) û bi zimanê erebî bû (Mecûs).

Ji kesên pendiyar, zaniyar û rûspîyên civakê re ev peyv dihat gotin yên ku gel fêrî zanist û olê dikirin, dîrokê beriya derketina Zerdeşt behsa wan kiriye, ji şertên kesê pendiyarê (magûsî) ku bi (12) zanistan zane be, Magûsî yek ji şeş êlên herî girîng in ku Dîako li ser wan Empiretoriya Medyayê ava kir.

Di dîroka kevnar de Medî yekemîn dewleta federal e, tevaya eşîrên zagrosê anîne gel hev û navê dewletê bûye navê giştî yê gelên çiyayên zagrosê

tevî Îrana niha, bakurê Mezopotamyayê, Azerbiycan û Anadolyayê dewleta Medî vedihewandin, li gor nivîsarên Herodot Med ji şeş eşîrên mezin ên Kurdan pêk tê, ji wan: Paratak, Strohat, Arizant, Bodî, Bosî, Magî.

Dîroknas (Berosus) berî zayînê di sedsala sêyemîn de jiyaye ew Keldanî-Babilî bû, ev dîroknasê Babilî behs dike ku Med ji destpêka serweriya Babiliyan ve li ser Babilê hukum dikirin ( ji ber ku di serdema vî dîroknasî de navê Med bûye navê giştî yê Zagrosiyan, Kurdên îroyîn) û ji nav (86) şahên Babilî de (84) ji wan ji Medî bûn û tenê (2) ji wan ji Keldaniyan bûn û ev yek zêdetirî (3000) sal beriya zayînê çêbûyê, dîroknas (Berosus) dibêje ku koma duyem a serwerên Babilê Medî bûn, ji (8) şahan pêk dihatin û heta (224) salan jî serweriya Babilê dikirin.

# Başî û Xerabî

Rêgeza ku bi sedema wê zerdeşt derket holê ew bû têkoşîna başîyê bi ramana Sepentamaîno û têkoşîna xereabîyê bi ramana Enkiramaîno yan Ehrîman, ne ji ber xwedawendan wekî ku li gel hin kesan li ser wan tê gotin.

Yek ji riyên tehrîfkirin û xerabkirina ola Zerdeştî bi anîna hin têgehên dastanî û efsaneyên ji olên din ew têgeh tevlî ola zerdeştî kirin, mîna ola Zorvanî ku di wê baweriyê de ye ku şerê di navbera Ahûramazda û Ehrîman de başî û xerabiyê li pey hev destnîşan dike, ev xerab kirin bû sedem ku dijminên Zerdeştiyê keysbaziyê li vî olî bînin.

Bi rastî Ahûramazda di gerdûnê de ew afirînerê yekane ye, û Ehrîman têgeheke ji ramana xirabiyê re tê gotin, lê navê Sepentamaîno ji ramana başîyê re tê gotin.

Ji gotinên Zerdeşt yên ku di Katat de (yasna 30-hat:1)

(Ez ê niha bi wan kesên ku dixwazin li her du rêgezan guhdar bikin (Başî û Xerabî) re bipeyivim, ew regezên ku ji bo pendiyaran jî girîng in, ez ê hişê rast bi qenciyê pîroz bikim, ji xweda re lava bikin, da ku hûn bigihêjin bextewariya ku hûn dixwazin).

Zerdeşt di mezhebê xwe yê îlahî de qonaxeke nû vedike – Başî û Xerabî – ev her du rêgez girîng in ku pendiyar jî tevlihev kirine, ji bo têgehiştina pirsgirêkê ew baldariya xwe ber bi aqilê saxlem ve dibe û bi rêya zagona cîhanî ya başîyê, dîsîplîn û durustiyê bi pirsgirêkê ve mijûl dibe, ev her du xal ji bo çareserkirina pirsgirêkê girîng in, wekî her dem ew pesen û spasîya xwedayê xwe dike, xweda yê ku me bi hişê me yê baş û rast ber bi bextewariyeke lehevdûhatî ve dibe û ji bo Ahûramazda yê yekane (101) nav hene bi Ahûramazda dest pê dikin.

# Yekanekirin

Zerdeştî yekemîn ola yekxwedayî ye ku di civakeke pirxwedayî de derketiye holê, di yek ji nivîsarên pîroz de wiha hatiye gotin:

Yasna 3- 8:((Ey pendiyar, dema ku ez di hişê xwe de têgehiştim ku tu yê pêşî û paşî yî û min nas kir ku tu çavkaniya hemû ramanên baş î, min bi têgihîştina xwe tu nas kir î, min dizanî ku tu çavkaniya rastîn a qencîyê yî û serwerê karê hemû microvan î))

Zerdeşt bi rêya lêgerîna xwe tê dighejê ku xweda yekem û nû ye - di ser dem û serdemê re ye - wî hem aqilê saxlem (VOHOMAN) û hem jî zagona cîhanî ya rastiyê (Aşa) afirandiye - ew du rêgezên ku gerdûnê bi pendî birêxistin dikin, herweha ew kiryarên mirovan dişopîne.

Zerdeştî yekem ol e ku exlaq wekî felsefe û bandora raman û hest li ser biryar û kirinên mirov nîqaş kiriye, Zerdeştî zêdetirî ji (900) salî ola herî mezin bû li Rojhilata Navîn, bandoreke mezin li ser çandên cuda yên herêmê kir û di van salên dawî de me dît ku pûtepêkirina bi vî olî zêde bûye.

# Her sê rêgez

Ji girîngtirîn rêgezên Zerdeştiyê: (HUMATA, HUKATA, HUVARASTA) ne, ku di zimanê Avestayî de tê wateya ramana baş, axaftina baş û kirinên baş.

Di nivîsa pîroz de Yasna 16 – Hat 3: wiha tê gotin:

(Yên ku li ser ramana baş axaftina baş û kirinên baş li hev dicivin ji bo hîn bibin berê xwe didin te, ew in yên ku li ser rêya ola te ya rast dimeşin, ji ber ku tu hînkerê payebilindê yekemîn î, yê ku îlham daye wan).

Felsefeya Zerdeştê pendiyar wiha dibêje: (Ramana baş, axaftina baş û kirinên baş), felsefeya wî mîna felsefeya Mihemmed pêxemberê Islamê ye, yê ku gotiye: (Misilman ew e, yê ku mirov ji ziman û destên wî parastî ne).

# Agir di Zerdeştiyê de

Zerdeştî ne agirperest in, di Katat û hemî nivîsarên kevnar ên din de tê gotin ku agir wekî metafor û sembola rasteqîniyê tê bikaranîn, Zerdeşt li ser "agirê te yê bi hêz ê rastiyê" diaxive (Yasna 43- 4) agirê fizîkî bi rastiyê xurt nabe lê agirê fizîkî ronîyê dide û rastî ronahiyê çedike, ji ber vê yekê em dibînin ku wî agir wekî metafora ronahiya rastiyê bi kar aniye.

Zerdeştî ronahiya xwedê di agir de dibînin, agir yek ji çar hêmanên jîngehê ye, yê ku pêwîste paqijiya wî were parastin, jêdera agir roj e, ew çavkaniya enerjî, ronahî û jiyanê bi giştî ye, çawa ku kevirê reş ji bo Misilmanan pîroz e û xaç ji bo Xiristiyanan pîroz e, agir ji bo Zerdeştiyan pîroz e.


# Zerdeştî li Iraqê

Ji bo naskirina Zerdeştiyê di çarçoveya civaka Iraqê de û zelalkirina rol û desthilatdariya wan di danîna urf û prensîpên olî de, di dema borî de Iraqa îroyîn beşek ji împaratoriyên Zerdeştî, Medî, Axemenî, Aşkanî û Sasanî bû, bajarê Bexdayê paytexta zivistanê ya hin ji van împaratoriyan bû, û Medayîn heman Kesifon bi xwe bû, Ereban jê re digotin Medayîn ji ber ku ji gelek bajaran (Medîneyan) pêk dihat.

Her çar bajar li gorî çar demsalan cihê serweriyê bûn (Bajarê Sed Derî, Rey, Hemedan û Kesifon li qeraxê Dîcleyê).

Yekem nîşana hebûna Zerdeştiyê li Iraqê di rêbernameya fermî ya Iraqê ya sala 1936an de hatiyê diyar kirin, di rêbernameyê de behsa hebûna olên Islamî, Xiristiyanî û Cihûyî û herweha baweriyên curbecur wekî Zerdeştî, Behayî, Mandeyî û Êzîdî hatiye kirin, ev jî " belgeyeke piştrast dike ku berê jî li Iraqê îtîrafik fermî bi hebûna Zerdeştiyan hatiyê kirin, ev îtîraf di dehsalên borî de ji ber tunebûna azadiya baweriyan li welat, ji nav çûye".

Hîn jî gelek kevneşopiyên mezin ji şaristaniyên Zerdeştî yên ku navenda wan li Iraqê bûn hene, ji wan kevneşopiyan (Taq kesra, Aqrquf li Bexdayê û Şikefta Qezqaban li Dukanê nêzîkî bajarê Silêmaniyê) û gelek kevneşopiyên din hene ên li çiyayên Kurdistanê ku Zerdeştiyan li Iraqê di asta herî bilind de nîşan didin.



# Medayîn

# Neh hîmên ola Zerdeştî

Divê bi neh hîmên sereke an jî rêgezên ola Zerdeştî bê bawer kirin, divê werin pîrozkirin, dema ku mirovê Zerdeştî ji yekê ji wan dûr bikeve tê wateya ku rêgezên Zerdeşt û afirîner Ahûramazda binpêk kirine.

Hîman ev in:

1- Baweriya bi yekbûna (Ahûramazda).
2- Baweriya bi perensîp û ola Aşûzerdeşt.
3- Baweriya bi wekheviya di navbera hemû mirovan de bêyî li cudhîya ol, nijad, reng û zayendê bê nêrîn.
4- Baweriya ku canê mirov perçeyek ji afirîner e.
5- Baweriya bi Amîşasptan (enerjiyên sermedî).
6- Baweriya bi comerdbûnê û alîkariya hejar û belengazan bê beramber.

7- Bawerî bi (pêşketin û nûjeniyê), (di ola Aşûzerdeşt û li ser bingeha zagona Aşa ku ne tenê paşverûtî lê bêxebatî û tembelî jî nayên pejirandin, ((Fraşa)) peyveke ji peyama Aşûzerdeşt e, ku tê de hemû mirovan ber bi afirînerî û pêşketinê ve dibe, pêwîstê aqil, giyan, çand û exlaqê mirovî ber bi pêşkeftin û afirînerîyê ve biçin, Aşûzerdeşt di peyama xwe de ji şopînerên xwe dixwaze ku romana cîhanê û jiyanê nûjen bikin, wekî ku pêxemberê welatên Aryen yên kevnar bawer dikir ku divê mirov hewl bide - her çend bi gavên piçûk be jî, bi aramî bigihîje jiyanek çêtir û kêrhatîtir).
8- Baweriya bi zagona Zerdeşt (Aşa) rasteqînî û duristî.
9- Baweriya bi her çar hêmanên xwezayê (av, ba, ax, agir).

# Zarok Zerdeştî ji dayik dibe?

Zerdeşt ji bo bijartinên mirovan rêz digirt û bi zelalî got: “Her yek ji we jin û mêr, bi guhên xwe guhdarî bikin, bi ramanên xwe yên zelal şêwirê bikin, bi pendiyariya xwe tevbigerin û berpirsên hilbijartinên xwe bin” (Yasna.2.30, Yasna11.31 Yasna,3.53).

Zarokê Zerdeştî ne Zerdeştî ji dayik dibe lê belê ew di (15-18) saliya xwe de piştî ku li ser Zerdeştiyê û olên din yên nêzîk dixwîne ola xwe hildibijêre, li hin welatan ji bo parastina vî olî bikin ev temen kêmtir kirine.

dema ku ew bi ola Zerdeştî bawer dibe û agahiyên têr bi dest dixe, merasîma hembêzkirina wî (Nafcot) an Sidra Buşî an jî bi navê Şalbendî jê re tê çêkirin, ev merasîm ji aliyê zilamê oldar Esrewan û bi amadebûna xizm û hezkiriyên vî Zerdeştiyê nû bi rê ve diçe, û piştî bi dawîbûna merasîman pîrozbahî li wî tê kirin.

# Nimêj û Rojî

## Nimêj

Her pênc ferzên nimêjê ji rêûresma rojane yên zerdeştiyan ne (Sibeh, Nîvro,`Esr , Mexreb , Êvar ) û bêrî her nimêjê divê destnimêjek tam bê girtin û di nimêjê de Kuştî (cilên sipî) tên li xwe kirin, divê li ser axeke paqij be û li ser axa dagirkirî nimêj nayê kirin, berê nimêjkeran bi roj ber bi rojê ve ye û bi şev ber bi her çavkaniyeke ronahiyê ve ye an ber bi agir ve ye.

**Nav û demên nimêjê:**

1- Hawan ew dem e ku ji beriya beyanyê heta nîvro dirêj dibe, ew nimêja sibê ye.

2-Rabîton an Raptîvîn, dema ku ji nîvro heya`esr dirêj dibe, ew nimêja nîvro ye.

3- Ozrîn: ji esrê heya berî mexribê dirêj dibe, ew nimêja esrê ye.

4-Estrotrîm, ku dema avabûna rojê ye, ew nimêja mexribê ye.

5- Uşahîn: dema şevê heya berbangê ye, nimêja evarê ye.

## Rojî

Di ola Zerdeştî de rojîgirtin ne ferzeke olî ye, di dirêjahiya dîroka Zerdeştiyê de rojîgirtin hatiye redkirin, rojîgirtin di Zerdeştiyê de li gorî hemû nivîsên Avestayê hem di beşên wê yên kevn û hem jî di yên nû de ((Old Avestan and Young Avestan)) ne hatiye hilbijatin ji ber van sedeman:

Baweriya Zerdeştî di navbera can û keresetê de li ser rêyên qencî û xerabiyê cudabûnê nabîne, lê belê herdu jî pêwîstî bi wan heye ji bo bidestxistina xudatirsyê, dibe ku her du jî neheqî li wan were kirin.

Tê wateya ku ola Zerdeştî ne yek ji olên rewanî ye, mîna hin ol û baweriyên din nabîne ku giyan girtiyê bedenê ye, lê belê wan di heman astê de dibînie û erke li ser mirov ku pabendî her du yan be, tiştê ku zirarê bide can û laş ew li dijî soz (peyîmana) Zerdeştîyê ye, ji ber vê yekê Zerdeştî bawer dikin ku divê laş bibe wekî navgîneke ku giyan bikaribe bi rêya wê li dijî xirabiyê şer bike, her kiryareke ku laş lawaz dike guneh tê dîtin.

Nivîsarên zerdeştî tekez dikin ku wekî mînak ((Standard or Young Avestan texts such as the Vidēvdād (Avesta, ed. Geldner, 3.33, 4.48, 7.70)) xwarin pêwîste ji bo berdewamiya jiyanê, herweha xwarina goşt têgihîştina giyanî zêde dike (wekî ku Mogan di wê demê de ev yek belav dikirin (behrînkirin) birçîbûn û tîbûn dibin sedema gelek derdkêşanê.

Nivîsarên Fehlewî, yanî nivîsarên serdema Sasaniyan li ber vî aliyê li dijî evdalîyê tekez dikin, û li ser ramana hevsengîya (an jî Paiman) di navbera xwarin û vexwarin û bêxwarin man tekez dikin.

Dihat gotin ku xwedatirsî ji encama xem nexwarina di derbarê xwarina hevseng de pêk tê û dûrketina ji hevsengiyê tê wateya çilekî û dilpijînê ((Dēnkard, ed. Madan, pp. 267, 295))

Di derbarê têgîna ((rojî, rōzag) de koka wê ne ji ola Zerdeştî ye lê ew ji ola Manî hatiye ya ku di serdema Sasaniyan de li Bexdayê derketiye holê, ji bo peyva (Pahrêz) an jî wekî ku îro kurd dibêjin (Parêz, پارێز ) ew peyveke Zerdeştî ye.

Tevî ku hejmareke hindik ji Zerdeştiyên Hindistanê têgeha rojiyê ji hindûsiyan wergirtine wekî navgînekê ji bo derbirîna xemgîniya xwe li ser miriyan diyar bikin, lê piraniya Zerdeştiyan hîn jî ji vê kiryarê nefret dibin ji ber ku ew laş lawaz dike û bi vî rengî şiyana giyan a şerkirina li hember xerabiyê kêm dike (Mîstry, rp. 19).

Serokkahînekî Zerdeştî (di asta zagonsaz de) vê dawîyê wekî pêşnîyarekê pêşkêş kir tê de got: Tenê rojiya ku destûr jê re tê dayîn, rojiya dûrketina ji gunehan e. ((Dhalla,P.187)) .

Hîn jî Zerdeştiyên îro baweriya xwe bi rojiyê naînin lê di her mehê de çar rojan ji xwarina goşt dûr dikevin, ji van çar rojan re di salnameya Zerdeştî de wek rojên “Napûr” tên bi nav kirin ku tê wateya (serjê neke) Zerdeştî di wan çar rojan de ajalan serjê nakin û goşt naxwin.

Rojên “Napûr” ev in: roja Bahman, roja Mah, roja Goş û roja Ram, ku di salnameya Zerdeştî de ev rojin 2,12,14, 21 ji her mehê.

Ji aliyêkî din ve kesê Zerdeştî heger pêwîstî hebe dikare çend saetan ji xwe re diyar bike di wan saetan de xwarinê (ne av) nexwe, heger ev kiriyar ji bo can û bedenê sûdmend be.

# Bihûşt û Dojeh

Di nerîna Zerdeşt de dema ku mirov ji dayik dibe ji her guneh û kirinên xerab pak (paqij) tê dinyayê, ew bi hilbijartinên xwe di jiyanê de û bi karanîna ramana xwe, dê şêwaza jiyana xwe ya ku ava bike destnîşan bike.

Li ser bingeha vê nerînê tu rêgez û bingeh ji bo bexşandina gunehan û lêborînan tune ye, ji ber ku li gorî bingeh û zagona Aşa her mirov dê qencî û xerabiyên ku dest û ramanên wî di jiyana wî de kirine bi erênî û neyînî bi dest bixe.

## Lê piştî hilbijartina azad, xelat û ceza çawa ye?

Di derbarê encamên kirinên ne rewa, bê rûmet û ne baş de Zerdeşt di (Yasna 31 haat 15) de wiha dibêje:

(Ez ji te dipirsim ey pendiyar cezaya wan kesên ku bi laloş û xeraban re ne, çi ye? herweha ew kesên ku di jiyanê de ji bilî kirina gunehan û zirarê li mirov û ajalan dikin tu armanceke wan tune ye, cezaya wan çi ye)?

Di derbarê yên xerab û kesên ku ramanên wan xerab in, ên derewîn de ew ê di cihê derewan de an jî di cihê xapandinê de bin.

Tiştê ku em ji Katatê Zerdeştî fam dikin ew e ku mebest ji cihê derewan razberî ye, ji ber ku giyana mirov bi ramanên xerab û kirinên ku nayên qebûlkirin digihêje cihê derewan û mirov digihje asta ku wijdanê wî diêşe, lê nikare derbas bike û di nav xem û bêhntengiyê de dimîne ji ber vê yekê jiyana wî dibe dojeh.

Ev yek li gel mirov bi xwe ji ber fikir û tevgera wî tê wateya bihûşt û dojehê, piştî mirinê cihekî diyar tune ji bo ku mirov berî mirinê ji bo wî cihî kar bike, an jî cihê îşkenceyê ji bo kesên ku xerabiyê dikin tune ye.

Pira Cenofaîtê ya ku di Islamê de bû pira rêya rast (Sîrat Elmusteqîm), ew pireke wateyî ye ji ber ku mirovê rast ger rastdar be dê jiyana xwe bi aramî derbas bike û ger mirov ne rast be dê jiyanê bi perîşanî, westandin, xem û bobelat derbas bike.

# Lêbobrîn li gel zerdiştiyan

Aşûzerdeşt tekez kir ku divê tundî, tirsandin û tundrewî bi dijminan re jî neyê bikaranîn, şîretan li mirovan dike ku li zanist, zanîn û rastiyê bigerin, bi ramaneke baş li dijî dijmin û xirabkaran şer bikin.

Ji gotinên Aşûzerdeşt ((Katat)) (Yasna 48-Hat 12): Kîn û hêrsê ji xwe dûr bixin nehêle tiştek te bikişîne ber bi tundiyê ve, bi ramaneke baş xwe li qenciyê bigire, mamosteyên geş ên ku dixwazin xwe bi rastiyê ve girêbidin dê şopînerên rastiyê bigihînin cihê bextewariyê, ey Ahûra, ew cihê ku yên rast lê dimînin.

Herweha ji gotinên Aşûzerdeşt ((Katat)) (Yasna30-Hat 3): Qurtalker û rizgarker di cîhanê de bi rastî jî pendiyar in û bi ramanên baş û kirinên ku ji hînkariyên îlhamê hatine wergirtin ew li pey banga erkê ne.

Herweha ji gotinên Zerdeşt : Ez di tariyê de şûrê xwe nakêşim lê ez mûmeke ku rêya kesên din ronî dike vêdixim.

# Avesta

Yek ji wan şaştiyên ku belav bûne ew e ku pirtûka Avestayê pirtûka pîroz a Zerdeştiyan e, lê ya rast ew e ku Avesta zimanê nivîsandinê ye, zimanê ku pirtûkên pîroz ên Zerdeştiyan pê hatine nivîsandin, hejmara pirtûkan bîst û yek pirtûk bûn lê di dema niha de tenê pênc ji wan mane, ew jî ev in:

1- Yasna ku ji (72) Haytî (Pesindan û Pîrozkirin) di nav de Katat (17 sirûdin) pêk tê.
2- Visperd ku ji (23) Grde (Rêç û Rêûresm an) pêk tê.
3- Vendîdad ku ji (22) Vargard (Pend û Zagon an) pêk tê.
4- Yişt ku ji (21) sirûdî (Sirûdên Lava û Pesndanê) pêk tê.
5- Avesta biçûk (Kordad Avesta).

Katat ku ji aliyê Zerdeşt ve hatine nivîsandin ew diyaloga Zerdeşt bi Ahûramazda re ye, Katat wekê rewanê Avestayê tê dîtin, hin lêkolîn dibêjin ku ew berî dema vedîtina nivîsê hatiye gotin, ew ristek helbestî ye xwedî peyameke kûr e ji mirovan re, ew beşa herî girînge ji Avesta yê di heman demê de beşa herî rast e ku tê de xerakirin çênebûye, ji ber ku di sîngê de bi ezberkirinê dihate veguhestin.

Katat (Gotinên Zerdeşt) têkiliya kesane ya kûr a Zerdeşt bi Ahûramazda (Afirîner) re nîşan dide, herweha em gelek diyalogên zelal di navbera pêxember û Ahûramazda de dibînin, peyama Zerdeşt tenê di van Katatan de peyda dibe lê ne di Avesta de, Avesta li gor bîr û baweriya zanyaran piştî mirina Zerdeşt bi (500) sal û zêdetir hatiye nivîsandin, Avesta rastî gelek fêlbazî, xerabkirin û guhertinan hatiye ji ber vê sedemê jî Katat wek çavkaniya Zerdeştî û referansa wan a herî mezin tê dîtin.


الترانيم الأفيستائية
كاثات زردشت
إبراهيم زراري
فهم
الزردشتية
بدون تحريف
المؤلف الباحث
إبراهيم زراري

# Ahûramazda jêdera pîtîferê (xêrê) ye 101 navên wî hene

Di olên din de xweda bi piranî wek xwedî hêzên pêşkeftî yên evînê, dilovanî û daxwazpêkan tên temsil kirin, di heman demê de hêzên wan ên xerab ên wekî ceza, hêrs, êş, çarenûs, agir an dojehê jî hene, ya herî girîng jî ev xwedawend dadger in û serwerên karên qenc û xerab in ên piştî mirinê, ev nêrîn di Katat de nayên dîtin.

Em dikarin ji gotina îmam Elî fambikin dema ku got:

(Xwedayê min, min ne ji tirsa dojehê û ne ji çavbirçîtiya bihûşta te ji te re îbadet kir, lê min tu hêjayî îbadetê dît lewma min ji te re îbadet kir) gotina îmam Elî rihê Zerdeştîyê bi xwe ye, yek ji navên wî Xwşdivî ye.

Navên Ahûramazda di pirtûka Xorda Avesta (Avesta biçûk) de derbas dibin, wiha tê gotin:

Zerdeşt got: Navê xwe ji min re diyar bike ey Ahûramazda! ev ya giranbuha, herî baş, dadperwer, herî bibandor, baştirîn şîfa yê ku xerabiyê (Daîva) ji holê radike.

Ahûramazda jê re got: Navê min yê ku pirs jê tê kirin ey Zeredeştê rastgo, navê min ê çaremîn Pakîya bêkêmasî ye, navê min ê heftan Xwediyê têgihiştinê ye, navê min yê yanzdehemîn ji Comerdiyê çêdibe, navê min ê dozdehan AHURA (Xudan) e, navê min yê sêzdehan yê herî Dilovan e, navê min ê çardehan bê Zerar e, navê min ê hevdehemîn ew kesê ku her tiştî dibîne,

navê min ê hijdehan Şîfa ye, navê min ê nozdehan Afirîner e, navê min ê bîstan Mazda yê zana, ez çavdêr im, ez Afirîner û Parêzger im, ez bi rûmet im, ez ji giyanan re dilovan im.

Ji xwedê (Ahûramazda) re sed û yek (101) nav hene lê derfet tune ye ku em hemû navên wî li vir bînin ser ziman, tu nav ji wan navan wateya tundî, tirsandin û îşkenceyê diyar nake, hemî nav wateya hezkirin, dilovanî, aştî û lêborîne diyar dikin.

## Amîşaspîntan (enerjiyên erênî yên herheyî)

Di perspektîfa Mazdasnaîzmê de Ahûramazda (Afirîner) xwedî hêzeke mezin, berfereh û xwedî hin taybetmendiyên cihê ye, her yek ji wan teybetiyan bi xweza, kok û eslê xwe bêhempa ye, wekî ramana baş, dadmendî, hêz, dilovanî, lêborîn, hestenermî, afrîneriya birsiqî, beriqîna bêdawî.

Hin ji van taybetmendiyan tenê di afirîner de peyda dibin û ew herheyî ne, mîna afirandina heyînan a berfireh a bê dawî û hêza bê sînor, hinên din ji van enerjiyên herheyî her çend di xwezaya Ahûramazda de bê sînor in û bê kemasî ne lê li gorî vîn û daxwaz afirîner, li gorî zagonên hebûnê ne, herweha dibe ku mirov van şiyan û îmkanên ku di nava xwe de van taybetmendiyan bi pêş ve bibe û bi pêş bixe wan xurt bike û bi dest bixe.

Çanda rêûresmên Mazdaîtiyê di şeş qonaxên zanînê re derbas dibe da ku xwe nêzî afirîner bike, mirov dikare behreyê bi dest bixe da ku bi rêya wê xwe bigihîje herheyînê, ji van şeş qonaxan enerjiyan re Amîşaspîntan tê gotin.

Wateya wan pak û pîroz e û tê wateya herheyînê, wateya giştî ji wan re pakên herheyî.

Destpêka van qonaxên zanînê an enerjiyan di Avesta de peyva Wehûmin an Fehûmin derbas dibe, di nerîna zerdeştiyê de tê wateya ramana baş, di gelek cihan de hatiyê destnîşankirin ji bo ku ji mirovan re bibe destpêka rêya wî di derbarê rastkirina hişê wî de.

Qonax an enerjiya duyem ji zanînê di Avesta de bi awayê (Aşa û Hîşta) ye, wateya wê baştirîn kirinên qenc û durustî ye, baştirîn hilbijartin duristî û dadmendî ye, ew peyam û pêşniyara Zerdeşt e, ji ber ku mirov di zagona hebûnê de wê bigihêje cih û asteke ku li gorî wî guncaw be.

Qonaxa sêyem di Avesta de (Xeşetreh û Îrah) ye, bi wateya hêz û xwegirtinê tê, di çand û adetên Zerdeştiyê de ev Amîşaspîntan di rola xwe ya şênber de ji bo aramkirin û kontrolkirina navgînên mirovan dixebite.

Qonaxa çaremîn a têgihiştina razber di Avesta de Spentaramîtî ye, wateya Spenta pak û pîroz e û Aramîtî tê wateya hêvî û daxwaz, yanî ew diyardeya evîn û xwestekên pak û pîroz e.

Qonaxa pêncem a zanînê naskirina razber di Avesta de (Haoratat) e ya ku tê wateya temambûnê, rola wê di perspektîfa şênber de parastina avê ye.

Qonaxa dawî ya rêya zanînê di çand û adetên Zerdeştî de Amratat e, ku tê wateya:

Li dijî mirin û tunekirinê / wateya wê ya giştî ev e

(nemirî - mirovê herheyî ew e ku digihêje asta pendiyariya şehrezayiyê, Zerdeştî ji mirovan daxwaz dike ku bigihêjin asta pendiyariya şehrezayiyê, Zerdeştî bi kurtî ola zanayan e).

# Cejn di Zerdeştiyê de

Cejn û festîvalên Zerdeştiyan bi avhewa, guherînên hewayê û rojên salê û mehan ve girêdayî ne.

Zerdeştî gelek cejnan pîroz dikin, lê ji wan çar cejnên sereke hene: Cejna Newrozê, Cejna Yelda, Şawî Çilla û cejneke din bi navê Cejna festîvalê, û Cejna El-Sed (100) an jî sed.

Her ku rojek û mehek bi heman navî li hev tên bi awayekî taybet wek cejneke mehane tê pîrozkirin, ji ber vê yekê her sal zêdetirî donzdeh (12) cejn û festîvalên mehane hene.

# Sembola Zerdiştiyan"Foroher"

Giringiya Foroher (bi koka xwe ji Mezopotamya ye) û mîna giringiya rihê pîroz e di baweriya Xiristiyan de, Arîyan ev nav li yek ji hêzên rewanî kirin, ya ku li gorî baweriya Mazdaiyan berî afirandina heyînan hebû û piştî mirin û tunebûna wan jî wê bimîne, ji cîhanê bilind dibe û aram dimîne, ev hêza giyanî ya ku mirov dikare jê re bêje cewhera jiyanê, nayê tunekirin.



Di serê vê sembolê de zilamekî ji Aryen e ( Mug - Zanyar - Magûsî) pîrek di hundurê xelekekê de ye, ev mirov nîşan dide ku xweda dixwaze mirov di qonaxa şehrezayiyê de bibîne, ku reftar û xuyabûna wî ya birêkûpêk ji bo kesên din bibe mînak, ji ber vê yekê weke sernav danîna rûyê pîrekî şehrezayî û cerbandinên pîrekî jîr nîşan dide, derbarê xeleka ku zilam tê de ye ew (sembola pabendbûna bi peyman û bêdawîtiyê dike) sembola cîhana şênberî ye ku mirov tê de ji dayik bûye û neçar e ku tê de bijî, herweha dema ku mirov mezin dibe û ji xirabiyê dûr dikeve û derbasî cîhana ramanê baş dibe, ew xeleka temamkirinê temsîl dike.

Du baskên ji sê rêzan li herdu aliyên xeleka mezin hene, bi xetên rast hatine xêzkirin, ev her sê beş nirxên exlaqî yên giranbuha ên ramana Zerdeştî ne yên ku bi navên "ramana baş", "axaftina baş" û "karê baş" tên naskirin.

Bikaranîna van her du baskan mirovê ku ji ola xwe hez dike bi baskên raman, axaftin û kirinên qenc dikare bi pêş ve biçe, pêş bikeve û xwe ji xeleka cîhanê rezgar bike û ber bi bihûşt û rasteqînîyê ve bibe.

Dûv jî ji sê rêzan pêk tê, raman, gotin û kirinên xerab nîşan dide, xweda ji mirov daxwaz dike ku xwe palpiştî baskên xwe yên ku ji fikir, gotin û kirinên baş pêk tên bike da ku xirabiya sêalî kontrol bike (fikr, gotin û kirinên xerab).

Em di xêzkirinê de du xetên li binê wêneyê ku bi xeleka sembola cîhana şênber ve daliqandî ne dibînin, her du bi du aliyên berevajî hev daliqandî ne, bi vî rengî ew ramana binary xirab û baş, an qencî û xirabiyê vedibêje Spentamaîno û Enkramaîno, tarî û ronahî, rastî û derew ew tû carî nagihêjin hev.

# Jin di Zerdeştiyê de

Beriya hezarên salan jin xwediya statuyeke giring û pîroz bû, wekî mêran di derbarê rêveberiyê, mîras, dayîna nêrîne de û di her tiştî de, mafê wê hebû ev yek beriya hezarên salan li welatê Aryen an jî Îrana îroyîn.

Di Avesta û Katat de tê gotin ku jin bi mêran re wekhev bûn çi di warê biryaran de, yan di warê azadiya bijartinê de, yan ji aliyê rêberiyê ve, heta di warê rêveberiya olî de jî, di heman demê de di belavkirina zanistê û hilbijartina hevjîn jî mafê jinan hebû.

Jin û mêr wekhev in di danûstandinê de, ji bo têgihîştina mafên jinên Zerdeştî, pêwîste mirov ji Katatê Zerdeşt dest pê bike ku ew bi wekheviya jin û mêr diaxive û pêşî jinan vedixwîne, wekî ku di Yasna (46/10) de hatiye gotin, di vê ayetê de Zerdeşt ragihand ku jin û mêr li ku dibin bila bibin, bi karên hiş û xizmeta ji mirovan re, her du jî dê xelatên giyanî biwekhevî wergirin".

Di Eîşt de hatiye gotin (em mêrên qenc û jinên qenc, gewre dikin).

Di Fisbard de tê gotin ku jinin hene ji bilî karên malê beşdarî merasîmên olî û civakî jî dibin.

Perensîpa xwedayî ya Katat mêr û jin di hemî karûbarên olî û civakî de wekhev dike, zêdetir ji civakên "pêşketî" yên nûjen yên ku tên dîtin û tê de te kirin, lê di serdema piştî Katat de rewşa jinan guherî û bi olên nû bandor bûn.

Cejna jinên Zerdeştî: Asfdîcan yanî cejna jinan di 29ê Bahman/18ê Sibatê de tê pîrozkirin, ew roja jin, dilsozî û zemînê ye, hinekan jî biryar dane ku ji 18 heta 24ê Sibatê rojekê ji van rojan pîroz bikin, ev cejn bi taybet ji bo jinan e, di heman demê de ev roj roja pîrozkirina zemînê ye ku sembola hezkirin û dilsoziyê ye ji ber ku ew ji her kesî re wekî hembêza dayikê ye.

Di vê rojê de jinên li welatê Arî yên kevnar, piştî nimêjê cil û bergên nû li xwe dikin û dema ku ji mêran diyariyan pêşwaz dikin, di destên xwe de kulîlkan digirin, pişt re dest bi dîlan û şahiyê dikin.

Piştî serdema Avestayê, statûya jinan di civakê de ji ber bandora olên din kêm bûye, Vendîdad ev kêmbûn di serdema Axmîniyan de zelal kir, û têvî xirapiyan jî, ji ber bandora hînkirinên xwecihî, hîn jî gelek mînakên maf û azadiya jinê hene.

# Zemawendî (zewac) di zerdeştiyê de

Zewaca di dema guncaw de û bi kesê guncaw re erkekî olî ye bi vê yekê Ahûramazda qayîl dibe, zewac dihêle ku mirov di warên jiyanê de hewcedariya xwe ya hestyarî ya bi hev re têr bike pêdiviya giştî ya ji bo hevalbendekî jiyanê ya lihevhatî beşek ji hesreta giyan e, ji bo ku xwe temam bike di heman demê de zewaca rewa derfetê dide ku hewcedariyên şênberî yên bingehîn pêk bên, piştî ku mirov hewcedariyên xwe yên din ên bingehîn pêk tîne, ew derfetê dide ku di asta giyanî de pêş bikeve.

Jin û mêr di warê hilbijartina hevjînê xwe de xwedî azadiyeke bê sînor in, wekî ku di nivîsên Katat de tê gotin dema ku Zerdeşt bi keça xwe Borgista re axivî û azadiya bê sînor da wê ku hevjînê xwe li gorî sinc û reftarên wî hilbijêre, zewac piştî gihîştina temenê pêwîst pêk tê ku ji bo keçan (16) sal û ji bo mêran (18) sal e, dest pêkê bi qebûlkirina herdu aliyan, paşê qebûlkirina malbatên herdu aliyan pêk tê, peymana zewacê di sê qonaxan de pêk tê û çend roj di navbera qonaxek û ya din de derbas dibin, her carê bi amadebûna kesê oldar Esrewan û bi amadebûna (6) (govanan) şahidan ji her aliyekî (3) şahid pêk tê, li ser qenciya keç û xort şahidiyê didin,

zemawendî tenê bi xeleka zewacê tê kirin, (qelen) mora talokirî an bilezkirî tune ye, ji ber ku zewac di navbera jin û mêr de hevpariyeke rastîn e, ji bilî prensîba hevsengiyê tu yek ji wan li ser yê din ne xwedî desthilatdariyeke bê sînor e û heta pileya pêncan jî zewaca bi xizman re nayê pejirandin, zewac hevkariyek girîng e ku ji hêla Aşûzerdeşt ve hatiye tekez kirin, ji bo parastin û zêdekirina nifşan, zewac tekane ye û pirkirin tune ye, di Zerdeştiyê de berdan tune ye, her du hevjîn di bin tu qanûn û şerîetê de nikarin ji hev biqetin, di heman demê de nabe ku tu alî desthilatdariyê li yê din bike, nabe ku jin di bin bandora mêr de bimîne, tevaya pirsgirêkan bi amadebûna malbatê û li ser bingehê hevpariya bê sînor û wekheviya di navbera her du aliyan de têne çareser kirin, berdan tenê di dema xiyanetê de piştî mukurhatina kesane pêk tê.



# Kesayetên jin ên navdar

Hin kesayetên jin di dîrokê de derketine ku di pêşengiya leşkerî, civakî, aborî û siyasî de rolek lîstine, ji wan jinan:

**Erdabama:** yek ji xatûnên herî mezin bû, mohreke wê ya taybet hebû.

**Mandana:** xatûna dawî ya Medan, keça Qral Astyacîs padîşahê dawî yê Medan û kurê wî tunebûn ji ber vê yekê desthilatdarî kete destê keça wî Mandana, pişt re ji wê kete destê kurê wê Gorş, ku ew jî padîşahê fursan bû.

**Artemîs:** di serdema Axmîniyan de Artemîs bû fermandara hêzên deryayî û di şer de di şikandina xwebîniya Yûnanan de rolek mezin list

**Banta:** fermandara cerdevaniya padîşah bû.


**Astenera:** keça Daryûş ê sêyem, bû fermandara giştî ji artêşa padîşahiyê re.

**Azerdxt:** piştî mirina xwişka wê Burandxt ew bû şahbanî, tê vê wateyê ku wan li pey hev serwerî kirin.

**Arthişsta:** seroka xezîneyê, wezîra darayî, şahbanîya çaremîn a Aşkanan.

**Sura keça Erdafan ê pêncemîn:** di artêşa bavê xwe de ceneral bû.

**Barîn:** keça Şah Qubad, di serdema Sasaniyan de şêwirmenda dadweriyê bû.


BORAN

## Hevparên bi olan re

Zerdeştî di piraniya pirtûkên pîroz ên olên din û hin ji wan jî di bin navê Magûs de bi awayekî erênî behsa wan tê kirin, di pirtûka pîroz a Cihûyan de (sefer Melûk ya duyem (17) 1- 6, di sefer Ezra (12) 1- 6 de, û herweha di sefer Îşaya (13-1)-9 de, sefer Eremya, sefer Nahûm û sefer Daniyêl, di seferên xwe de gelek çîrokên li ser Magûsiyên Medî anîne ser ziman.

Di serdema nû ya ola Xiristiyanî de di sefer Tekwîn (2-13) -14, û sefer Tekwîn Eshah (6), û sefer Tekwîn (12----1) heta (16) behsa Magûsiyan hatiyê kirin, û behsa herî girîng ya Magûsiyan di pirtûka pîroz a Xiristiyanan de - Incîl Metta Eshah a duduyan li ser mizgîniya sê padîşahan bi zaîyna Mesîh û anîna diyariyan û Mesîh wan ji kuştinê rizgar bike.

Di Qur'anê de sûreya Hec ayeta (17) an de behsa Magûsiyan hatiye kirin û di sûreya Furqan ayeta (38) an de jî behsa xwedanê Res hatiye kirin ku bi şîroveya Beha'ullah hatiye piştrastkirin ku ew gelê Zerdeştî bûn ku li her du qiraxên çemê Aras dijiyan û bûne Res.

Em dibînin ku behsa Magûsiyan bi rêya axaftinên xelîfe Umer bin Xettab û îmam Elî li çend cihên cuda hatiyê kirin, qewîtiya wan hatiye kirin ku ew xwedanê pirtûka ne û yekperest in, herî dawî jî Magûsî li Kufeyê bindestbûn heta serdema îmam Elî bin Ebû Talib yê ku bi baştirîn reftar bi wan re danûstandin kir û fetweya pîrozkirina Newrozê ji wan re derxist û bi wan re tevlî pîrozkirina cejnê bû, wekî ku Mûftiyê Iraqê Şêx Ebdulkerîm Muderres di yek ji xutbeyên xwe de gotiye.

Ola Kakaî di pirtûka wan a pîroz Sirancam de Zerdeşt wekî Cebrîl û Benyamîn dibînin.

Herweha di ola Ezîdî de ji gelek alîyan ve tiştên hevpar hene weke bawerîpêkirin, cil û berg, rêûresmên olî û ………hwd.

# Cihêrengiya di ola zerdeştî de

## Li gor nerîna (Irfad Dr. Ramyar Parfez Karançia)

1- Ola Zerdeştî kevintirîn ola eşkerekirî (li gor wî) li cîhanê ye, di demên kevnar de ji aliyê Zerdeşt Spîtama ve yê ku girêdayî sîstema Mazdayetîyê dest pê kiriye.

2- Damezrênerê yekxwedayîtiyê bû, ku wekî hînkirinên olî di dîroka mirovahiyê de cara yekem e.

3- Zerdeştiyan agir di cîhana şênber de wekî cewherê zindî yê Ahûramazda didîtin, tevî ku hemû olên kevnar rêz ji agir re digirtin lê ola Zerdeştî cihekî pir bilind daye agir, di tu olên din de mîna wî tune ye.

4- Gewrekirin û rêzgirtina ji xwezayê û hemû heyînên xwezayê re perensîpeke bingehîn e di ol de, têgîna xwezayê bi têgîna heyînên xwedayî re hatîye xêzkirin erke li ser mirov ku xwedî li wan derkeve, di cihanên exlaqî, madî û giyanî de bi yekîneyeke tenê bi awayekî pir xweş hatine cîbicîkirin, di têgihiştina Zerdeştîyê de ya (6) Amîşaspentan de hatîye bicihkirin.

5-Vê olê azadiya bijartinê dida mirovan û ji wan dixwest ku hişê xwe ji bo hilbijartina di navbera qencî û xerabiyê de bikar bînin, ew xwedî vîna hilbijartina raman, gotin û kirinên xwe bin, di heman demê de berpirsiyariya hilbijartina xwe bin, hişyarî da wan ku ji bo hilgirtina encaman amade bin.

6- Zerdeştî xwedî karaktereke gerdûnî ye, di navbera (Universe) Makro û (Man) Mikro de têkiliyek heye, tiştê ku li derve heye li hundir jî heye enerjî, hişmendî, sîstem, hêz, evîn û kamlbûn karakterên makro û hem jî mikro hene.

7- Aşa zagona gerdûnî ye ku hemû heyîn li ser bingeha wê ne ji atomê bigire heya pergalên rojê, ew her tiştî kontrol dike - ji hucreyê bigire heya gerdûnê.

8- Girîngiya hizirê ji bo avakirina jiyan û çarenûsa mirovan di cîhana şênber û giyanî de.

# Çavkanî


1- Pirtûka têgihiştina Zerdeştiyê Ibrahîm Zirarî.
2- Katat Zerdeşt Dr. Elî Çaferî.
3- Pirtûka Korş Nîknam.
4- Pirtûka têgihiştina Zerdeştiyê Ibrahîm Zirarî.
5- Arya kevnar û Kurdestana herheyî. (Kurd gelê herî kevnarin). nimêjên Gulyamof.
6- Gotarên rêberê Hewza Zerdeştî Esrewan Endaz Hewezî.
7- Irfad Dr. Ramyar Parfez Karançia kovara (Jam-e-Jamshed).
8- Pirtûka ((Cihêrengiya olî)) ya Dr. Saad Selûm.

9- (Kurd di pirtûka pîroz de) (Kurds in the Bible) – (Dûgilas Laîton) Douglas Layton – Master û Doktora ji zanîngeha (Enqaa) ya teolojî li dewletên yekbûyî yên Amerîkayê.
10- Gotara Esrewan Endaz Hewezî.
11- Pirtûka Vendîdad – Haşim Razî.
12- Herodot.
13- Încîl.
14- Arya Kevnar: Nimêjên Gulyamof.

**Berhevkirin: Felsefeya Zerdeştî**
**Navê pirtûkê: Ez Zerdeştî yan Magûsî me?**
**Çapa duyemîn**
**1444 K , 2024 Z**
**Weşanxaneya El-Ereb bo Weşan û Belavkirinê -**
**Misir – Por Seîd**

**Mafê çapkirin û belavkirina vê xebatê ji nivîskar re parastî ye, ji nû ve çapkirina, bi tevahî an beşek, an kopîkirin, fotokopîkirin, wergerandin, neqlkirina wê, an veguheztina wê bi dîjîtalî û peydakirina wê li ser Înternetê bi tu awayî destûr nayê dayîn, ji xeynî destûrek nivîskî ya berê ya nivîskar an weşanger.**